Newroz Hejmar (70) Rûpel 9) Çirya Pêşîn 2006z – 2618k

Bîranîna Apê Mûsa Enter

Amedekar : Reşoyê Pîrê

Li Kurdistana Bakur, herêma Mêrdînê, gundê Zivingê, di şikeftekê de, sala 1920 an, Mûsa Enter ji dayîk dibe . Mûsa ji êla Botan û malbata Mihoyê Teze ye. Sê zarokên wî hene . Enter, Reşan û Dicle

Mûsa xwendina xwe ya pêşîn, li Mêrdînê û ya lîsê li Enedolê kuta dike.Mûsa Enter, cara pêşîn, li Enedolê tê girtin. Ew ji bo xwendina zanîngehê, berê xwe dide Istenbolê, di şaxê edebiyetê, beşê felsefê de bi cî dibe . Di zanîgehê de, pir xwendekarên Kurdperwer Mîna Mustefa Bucak, Fayq Bucak,Yusif Azîzogju..... dinase. Û bi hev re pir komelan dadimezrînin .

1- Pansiyona şagirtên Dîcle, sala 1942an .

2-Komela Hêvî sala 1943an .

3 – Komela rizgarkirina Kurdan 4- Pansiyona şagirtên Firat sala 1948 an.

Maûsa Enter, di sala 1958 an de, dest bi weşanên xwe dike. Gotara yekemîn ya di bin navnîşana " Eman çi welatekî pêşketî ye " di rojnama " Îlerî Yurt" ya ku, li Amedê derdiket de diweşîne. Di sala 1959 an de, gotarekê bi navnîşana " Qimil " di wê rojnamê de belav dike . Ji bo wê gotarê, Mûsa tê girtin . Piştî tê berdan, careke din tê girtin û berê wî didin Istenbolê, di oda 38 an de, şeş heyvan radikeve. Mûsa, di wê şeş heyvan de, pirtûka xwe ya yekem, ya bi navê " **BIRÎNA REŞ "** dinivîse. Di sala 1963 an de, bi Yaşar Kaya, Medet Serhat û Ergîn Koyncu re, **kovara Deng** diweşîne. Piştî du heyvan, conta Tirk, destê xwe didin ser kovarê û Mûsa Enter dixine girtîgehê .Di sala 1965 an Birîna Reş û di sala 1967 an de Ferhenga Kurî diweşîne . Di 1969 an de, ji ber nivîsa xwe ya di rojnama " Dogo" de, hatibû weşandin careke din têye girtin. Di sala 1971 an de, ji hêla dadgeha Amedê, ya contayê ve tê girtin û Çar sal ceza didine wî. Piştî ji zîndanê tê berdan, di sala 1976 an de, Mûsa Enter vedigere gundê xwe û ta sala 1989 li wir dimîne. Di wê salê de, Mûsa vedigere Istenbolê . Li Istenbolê, kovarên " **2000 , Dogru, Medya Gîneşî û Den "** Hevpeyv û nivîsarên Mûsa Enter diweşînin . Di sala 1990î de, Pirtûka wî ya bi navê "**Hatiralarim**" ji hêla pirtûkxaneya " Doz " ve tê weşandin. Di wê salê de, partiya " **Keda Gel** " tê damezrandin û Mûsa Enter cihê xwe di nêv refê wî de digre û dibe endamê komîta partî, ta qedexekirina partî ji hêla conta Tirk ve, karê xwe berdewam dike . Ji sala 1990î, dema weşandina rojnama " **Yênî Ûlke** " ve, nivîsarên Mûsa Enter, her hefte, , bilî nivîsarên wî, di rojnameyên **WELAT** , **TEWLO** û kovara **REWŞEN** de, tênе weşandin .

Di 20 ê Rezbera (Êlon) 1992 an de, kalemêrê 74 salî, →